



KNK Bulten

Bultena Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê * Hj.: 8 * Gulana 2009 - Hejmara taybetî

Deh salîya KNKYê bila li neteweyê Kurd û hemû Kurdistanîyan pîroz be!

Di deh salîya KNKYê da:
Bijarteyek ji belge û nivîsên ji 1999ê heta 2009ê

Xewna Ehmedê Xanî û KNK

”Ger dê hebûya me tifaqek
Rom û Ereb û Ecem timamî
Hemîyan ji me ra dikir xulamî
Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me ilm û hikmet”

Ehmedê Xanî

“Utopyaya mamostayê mezin ya hingê, piştî sedan salan, di 24ê Gulana 1999ê da li Hollandê bajêrê Amsterdamê, di salona otêleke dîrokî da, bi rondikên 700 kesî û bi rabûna destên Kurdan hate nav jîyana rojê. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, bi çoşeke mezin ya bi milyonan Kurdan, ku dilên wan bi marşa neteweyî “Ey Reqîb” ve diavêt, bi rêzgirtin û wekî şahîyeke mezin hate aşkera kirin.

Rehet raze Kawayê bab, rehet raze Guherdz, rehet razin Melayê Bateyî, Feqiyê Teyra, Melayê Cizîrî, Şêx Ubeydullah, Bedir Xan, Şêx Mehmûd Berzencî, Şêx Seîd, Seyid Riza, Qazî Mehemed, Mela Mustefa Barzanî û Qasimlo!.. Rehet razin Elî Esker, Hêmin, Cegerxwîn, Mezlûm Doxan, Mehsûm Korkmaz [Egîd] û ey Zilan!.. Rehet raze şair, ey filozof, ey mamosta Ehmedê Xanî, êdî em jî xwedanê yekîtîyekê ne!..”

[Ji broşûra “Peymana KNKYê”, r. 5, Çirî 1999]

KNK û deh sal

ROJAN HAZIM

KNK [Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê] 24ê Gulana 1999ê li bajêrê Hollandê Amsterdamê bi beşdarîyeke xurt û mezin ya neteweyî û navneteweyî hate damezrandin û merkeza wê li Brukselê ye. Îsal 24ê Gulana 2009ê KNK dibe deh salî. KNK rêxistineke sosyopolîtîk û sosyokultûrel ya neteweyî ye. KNK bi armanceke îdeal hatîye damezrandin ku yekîtîya neteweyî pêk bîne. Ev armance ji aliyê teorîk û pratîk ve daxwaza hemû Kurdan û Kurdistanîyan îfade dîke. Statuya kolonyal ya Kurdistanê, zordarîya dewletên dagîrker, xelkê Kurd mecbûrî berxwedan û têkoşîneke xurt û mezin ya neteweyî kirîye. Dîroka dûr û nêzîk ya bizava bi giştî neteweyî ya Kurdistanê, tiştêk bi zelalî derêxistîye meydanê ku, di vê prosesa têkoşînê da, çeperê neteweyî, ji ber bêtifaqîya navxweyî û belavîya hêz û dînamîkên neteweyî, gelek caran qels û lawaz bûye û vê rewşa negatîv keys û cesaret daye dijminan ku êrişkarîya xwe gelek hovane bidomînin, şiddetê di dereceya herî bilind da bi kar bînin û hindî ji destê wan bêt Kurdan bibirînin û bi vê rêya nemirovî xwe ji ”pirsgirêka Kurd û Kurdistanê” xilas bikin! Vê realîteya heyî û niyeta dagîrkeran, Kurd mecbûr kirine ku li rêyên yekîtîya navxweyî bigerin ku hêz û enerjîya xwe ya navînî di rikeberîya navxweyî da xerc nekin, tam bereks, bi yekkirina hemû hêzên neteweyî bizava neteweyî ya antî kolonyalist xurt bikin û pêşbêxîna û bi vê rêyê Kurdistanê rizgar bikin. KNK ji gihîştina vê bîr û bawerîya yekkirina hêz û dînamîkên neteweyî peyda bûye. Bi avabûn û hebûna KNKYê, bîr û hizira tifaqa navxweyî motive bûye, xurttir bûye. KNK wekî rêxistineke sihwane ya neteweyî, ji destpêka avabûna xwe heta îro, di midehê van deh salan da, bi rol û mîsyonê yekîtîya neteweyî rabûye, timamî enerjîya xwe ji bo vê armancê serf kirîye. Helbet vehûnandina yekîtîyeke kamil ya neteweyî prosesêke dûr û dirêj e, bi astengan ve tîjî ye. Lê daku bigihîne vê armancê, divêt xebateke xurttir bête kirin. Şik têda nîne ku rewşa Kurdistanê û paşvemayîna civata Kurd û herweha rol û pozîsyona dewletên dagîrker û destekdarên wan, li ser xebata pêkînan yekîtîyeke kamil ya neteweyî tesîreke negatîv dîke. Belê xelkê Kurd bi germahîya têkoşîna salan, îro gelek bi hêvî ye û dê bigihîne vê armance xwe ya pîroz jî. Bi van bîr û hiziran bila deh salîya KNKYê pîroz be.

Hindek paragraf, xal û bendên giring ji "Peymana Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê":

(Pejirandin 26.05.1999 Civîna Damezrandinê, guhertin, 23.08.2000 Civîna Duyem, 17.12.2001 Civîna Sêyem, 21.12.2002 Civîna Çarem, 14.05.2006 Civîna Şeşem, 13-14. 12. 2008 Civîna nehem)

Destpêk:

Em nûnerên partî, rêxistinên siyasî, civakî, roşenbîr û kesayetiyên welatparêz yê Kurdistanî ku bi mebesta avakirina dezgeheke bilind ya Kurdistanî, ji bo parastina berjewendî û yekîtiya neteweyê Kurdistanê, di roja 26 Gulan 1999 [*] de li hev kom bûne û vê peymanê îmza dikin.

[*] *Noteke giring: Kombûna damezrandina KNKê, sê rojan -24/25/26ê Gulanê- ajotîye. Peyman piştî gotubêjê û riberizên kûr û dûr û dirêj di roja dawiyê da, anku di roja 26ê Gulanê da hatîye îmza kirin. Lê roja pêşî ya kombûnê, anku 24ê Gulanê wekî roja damezrandina KNKê hatîye qebûl kirin. RHJ*

„...Kurd yêk netewe ye, ku bi proseseke dîrokî û li ser bingehê yekîtiya niştîman, ziman û çandê li Kurdistanê peyda bûye. Ew ji bo rojên azad û çêtir, xwedanê hesta neteweyî, hêvî û daxwazên hevbeş e.

Bab û bapîrên Kurdan li Rojhilata Navîn di avakirina şehrîstaniyê de xwedanên paydarîyeke aşkera ne. Kurd, bi dirêjahîya dîrokê re bûne xwedanên çend dewletên ku di bin navên cuda da peyda bûne. Herwisa bi dehan Mîrnişîn jî, navçeyên Kurdistanê ava kirine. Paşê di sedsala bîstan da bûne neteweyekî perçiqandî û ji hemû mafên xwe yê rewa bi taybetî jî piştî dabeşkirina Kurdistanê, di navbera çar dewletan de, bêpar mane. Vê jî Kurd naçar kirin, ku dest bidin hemû rêyên xebatê, ji bo parastina nasnameya neteweyê xwe.

Ligel hemû felaketan jî, gelê Kurd ji bilî Erebb, Tirk û Farisan yêk ji çar gelên sereke yê Rojhilata Navîn e... Gelê Kurd ku hejmara wî nêzîkî 45 milyoni ye û di dirêjahîya dîrokê da, li ser axa xwe jîyaye, ji destpêka sedsala bîstan ve bindest û dabeşkirî bûye û ji mafê diyarkirina çarenivîsa xwe bêpar maye. Ev yêk li dijî peymanên navneteweyî, peyama gerdûnî, yê mafên mirovan û hemû prensîb û qanûnên navneteweyî û xwezayî ye.

Ji bo bidestxistin û bikarînan mafên çarenivîsî û parastina nasnameya neteweyî û yekîtiya niştîmanî, em vê peymanê radigihînin û aşkera dikin ku em bi vê yêkê bi agahdarîya cihanî ya mafên mirovan, bi peymanên navneteweyî, peyamên gerdûnî û prensîb û qanûnên navneteweyî ve girêdayî ne...“

Kurdistan û Gelên Kurdistanê

a. Kurdistan, ew welat e ku li ser erdê wê Kurd, bi hemû dîn, dînza, zarav û devokên xwe yê cuda ve dijîn. Ew, ji wan hemû navçeyên bi hev re girêdayî ne ku piranî ji Kurdan pêk tê. Kurdistan yek welat e û parçekirina wê jî ne xwezayî ye.

b. Guhartina demografiya Kurdistanê bi derxistin û bi zor koçkirina her Kurdistanîyek ji her navçeyên Kurdistanê, herwiha anîna xelkên di û bicihkirina wan di van navçeyan de, ji aliyê dewletên dagîrker ve, karekî ne rewa ye û bi hîç şeweyan naye pejirandin.

c. Gelên Kurdistanê ji van yê jêrîn pêk tên:

- Neteweyê Kurd
- Neteweyên Asûrî-Suryanî-Kildanî û gelên di yê Kurdistanî wek Ermenî, Tirkmen, Erebb, Tirk, Cihû, Azerî, Faris ku li Kurdistanê xwediyê hebûneke dîrokî ne û xwe Kurdistanî dihejmêrin.

Mafên Bingehîn

a. Gelên Kurdistanê hemû wekhev in û bi hîç awayan, di warê regez, ziman, dîn, dînza, bawerî, jin, mêr û di derfetên civakî de cudahî di navbera wan de nayê kirin.

b. Zimanê Kurdî zimanê fermî yê Kurdistanê ye.

c. Yê ne Kurd in, lê beşek ji gelê Kurdistanê ne, mafê wan heye ku taybetmendiyên xwe yê etnîkî biparêzin, bi awayekî azad û serbest ziman û devokên xwe pêşbixin, bi hêz û geş bikin, herwiha rêxistin û dezgehên ji bo pêşxistina çanda xwe ava bikin û bi rê ve bibin.

d. Li ciyên ku piraniya xelkê wê Asûrî-Suryanî-Kildanî ne, digel zimanê Kurdî zimanê Asûrî-Suryanî-Kildanî jî zimanê fermî ye. Herwiha neteweyên di jî xwediyê vî mafî ne.

e. Hemû xwediyên dîn, dînza yê Kurdistanî dikarin wacibên xwe yê dînî, ayînên xwe bi awayekî azad, bi cih binin, sazîyên xwe yê dînî damezrînin...“

Prensîbên Giştî

a. Kongre, peyama cihanî ya mafên mirovan, prensîbên mafên çarenivîsî û peymana Neteweyên Yekgirtî ku ev prensîb pejirandine, ji bo xwe dike bingeh.

b. Di terkîba endamên KNKYê de, wekhevîya cinsiyetî heye. Ev prensîb, di hemû xebatan, hemû komîsyon û komîteyan da li ber çavan tê girtin.

c. Dabeşkirina Kurdistanê li dijî îfade û daxwaziyên gelê Kurdistanê çêbûye û mafê diyarkirina çarenivîsa gelê Kurd bin pê bûye.

d. Berjewendiyên sereke yê gelên Kurdistanê ji hemû berjewendiyên parçe û partiyên siyasî yê Kurdistanê bilindtir in.

e. Bi hîç sebebî nabe ku, partî, rêxistin û kes li dijî berjewendiyên neteweyê Kurd, piştgirî û hevkarîyê bi dewleteke dagîrkerê Kurdistanê yan bi dewleteke di re, bikin.

f. Berjewendiyên hevkarîya bi welatekî dagîrker yê Kurdistanê re, ya li dijî bizava azadîxwaz ya neteweyî, sûcê neteweyî dizane.

g. Kongre, şerê di nava partî û rêxistinên Kurdistanê de red û tawanbar dike.

h. Tu partî, rêxistinên siyasî û kes nikarin dest ji hîç parçeyên Kurdistanê berdin.

Armançên Kongreyê

a. Kongre, ji bo bihêzkirina giyanê hevkarî û hevxebehatê di nav parçeyên Kurdistanê de, li ser bingehê yekîtiya neteweyî û berjewendiyên sereke yê xelkê Kurdistanê dixebite.

b. Kongre, bi komkirina partî, rêxistin û kesayetiyên niştîmanperwer yê Kurdistanê di çarçoveya vê dezgeha neteweyî de, nunertiya gelê Kurdistanê dike.

c. Kongre, hewl dide ku kêşeyên navxweyî û hemû şeweyên nakokî û dijayetiyan di nav partî û grubên siyasî yê Kurdistanî û aligirên wan de çareser bike.

d. Kongre, hewl dide ku, kêşeyên navbera xelkên Kurdistanê û welatên cîranên wî bi rêya aşî û dostaniyê çareser bike.

e. Kongre, her reng şiddetê red dike, parastina rewa qebûl dike.

f. Kongre ji ber realîteya civata Kurd û Kurdistanê ya pašwemayî, di hemû kar, xebat û organa da ji bo jinan prensîba „diskrîmînasyona pozîtîv“ qebûl dike û bi cih tîne.

g. Kongre, piştgiriya xebata rizgarîxwaz ya neteweyî ya Kurd, li hemû parçeyên Kurdistanê (Tirkîye, Îran, Îraq, Sûriye) dike û pêşkêşkirina her alîkarîyeke pêwîst, ji bo çareyeke siyasî erkê xwe dizane.

h. Kongre, mîna nûnerê gelê Kurdistanê li ser asta dezgeh û rêxistinên navneteweyî û cihanî, ji bo bidestxistin û parastina berjewendiyên wê, xebat dike û ji bo vê armançê, ligel rêxistinên siyasî yê Kurdistanî hevkarîyê dike.

i. Kongre, hewl dide ku dostaniya di nav gelê Kurdistanê û gelên Erebb, Tirk, Faris û hemû gelên cihanê de bihêz bike.

j. Kongre, piştgiriya parastina azadî û serbestiyê ji bo hemû dîn, dînza, bîr û baweriyên li Kurdistanê ne, dike.

k. Kongre, ji bo nûvejîn û geşkirina ziman û çanda Kurdî hewl dide.

l. Kongre, ji bo bicihkirina aşîyê li herêma Rojhilata Navîn û cihanê hewl dide, herwiha her bi çi navî bin li dijî hemû bîr û baweriyên nijadperestî û tundreviyê xebatê dike.

Endamêf

(Guhertin, 23.08.2000 Civîna Duyem)

a. Herkesê 18 salî yê/ya ji reng, bawerî, cinsiyet û neteweyên cuda yê Kurdistanê, dikare bibe endamê KNKYê.

b. Kes û rêxistinên faşîst û kevnepereşt, nikarin bibin endamên KNK.

c. Kesên ku bi cezayên kriminalî hatine cezakirin nikarin bibin endamên KNKYê. Yê ku sûce kriminaliyê li ser sabit bûyî ji endametiye tèn derxistin.

d. Kesên du jin heyî nikarin bibin endamê KNKYê, yê du jin heyî ji endametiye tène derxistin.

e. Kes û rêxistinên ku bi kiryarên xwe ve zerarê digihînin yekîtiya neteweyî nikarin bibin endamên KNKYê, endamên wisa jî tène derxistin.

f. Partî, rêxistin, sazî û kesayetiyên serbixwe yê niştîmanperwer ku beşdarî civata damezrandina kongreyê bûne û peymana wê dipejirînin, dibin endam.

g. Partî û rêxistinên siyasî yê ku endamên wan di KNKYê de nînin,

dikarin tède bibin endamên çavdêr. Dikarin dîtînen xwe di civînan de bînin ziman lê mafê wan yê dengdayîne nîne.

h. Civata Giştî dikare endamên nû ji bo Kongreyê bipejirîne.

i. Partî, rêxistin û sazîyên endamên KNKYê, çawa ku endamên xwe ji bo endamatiya KNKYê destnîşan dikin, wiha jî xwedi maf in ku endamên xwe biguherin

j. Kongre biryar dide ku her partiyek, rêxistinek û dezgehêk, çend nûnerên wana hebin û bi çi şeweyî nûneriya wana tê kirin û hilbijartina endamên serbixwe çawa dibe.

k. Civata Giştî di paşerojê de peyreveke taybetî ji bo hilbijartina endamên xwe amade dike.

Civata Giştî ya

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê

26 Gulan 1999

Belgeyêke dîrokî: "Belgeya Stratejîya Yêkîtiya Neteweyî ya Kurdistanê"

Di mîdehê deh salan da yêk ji karên herî giring ya KNKYê amadekirina "Belgeya Stratejîya Yêkîtiya Neteweyî" bû. Vê belgeyê tesîreke gelek pozîtîv li ser prosesa wehîndandina yêkîtiya neteweyî kir û perspektîveke nû derxistê meydane. Bi munasebeta deh salîya KNKYê dîsa ve di vê hejmarê taybetî ya "KNK Bulten"ê da cih didine vê belgeya giring:

Ji KNKYê pêşniyara Peymana Neteweyî

KNK bi kombûna xwe ya giştî ve dixwaze gaveke nû biavêje di warê yêkîtiya neteweyî da. Ji bo vê yêkê, "belgeya stratejîya yêkîtiya neteweyî" ji terefê Konseya Rêvebir ya KNKYê ve hate amade kirin û bi "erêkirin" a kombûna mezin ya II. ve wekî pêşniyarek ji bo bîr û rehiya Kurdistanê hate pêşkêş kirin. Piştî gotûbêjê û riberizên berfireh dê di kombûna giştî ya KNKYê da bête "erêkirin" û ev belgeyê dê bibe peymanê nivîskî ya hemû hêzên neteweyî ku hemû dînamîkên neteweyî di muştêrekeke asgarî da bigihîne hev. Vê pêşniyarê belgeyê didin:

Pêşniyara ji bo amadekirina "Belgeya Stratejîya Yêkîtiya Neteweyî ya Kurdistanê"

Boçî ev belge:

Têkoşîna di navbeyna hêzên Kurdistanê û dewletên kolonyalist da gihiştîye qonaxêke nû. Ev pêşhatine, tifaqa navxweyî jî her demî zêdetir elzem dike. Heta îro jî bo wehîndandina yêkîtiya neteweyî gelek kar û xebat hatine kirin, gav hatine avêtin, lê mixabin ku heta nihe jî platformeke ku "bila istîsna" hemû hêzên neteweyî bîne nik hev pêknehatîye. Piştî tecrubeyên tahl yê demên borî, îro şuûra yêkîtiya neteweyî di bîr û hizîra xelkê Kurd da bilind bûye û xelkê me vê yêkê li ser milê pêşengên polîtîk ferz dike. Di roja îro da, doza Kurd û Kurdistanê hewcehiyêke jîyanî bi yêkîtiya neteweyî heye. Êdî di navbeyna hêzên neteweyî da avakirina zemîn û kanalên diyalogê karekî zerûrî ye. Divêt zemînekî ku hemû hêzên neteweyî pêkve girêdide rojek zûtir bête ava kirin. Digel vê yêkê, norm û rêzîkên ku pêkve hêzên neteweyî li ser berjewendiyên neteweyî girêdide jî divêt bêne tesbît kirin û di jîyana pratîk ya polîtîka neteweyî da bêne serdest kirin. Bi vê armançê, em wekî KNK, vê "Belgeya Stratejîya Yêkîtiya Neteweyî" pêşniyar dikin ku di bîr û rehiya giştî ya neteweyî da bi berfirehî bête axivtî, gotûbêjê û riberiz li ser bête kirin û encameke di xêra neteweyî Kurd da bête bi destxistin.

Statuya dagîrî û kolonyal ya Kurdistanê:

Kurdistan kolonîya navneteweyî ye li rojhilatnavîn. Digel nîrê kolonyalîzma dewletên Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê ya li ser stuyê xelkê Kurd, çar parçetî jî devam dike. Neteweyê Kurd di bin destê van dewletên dagîrker û kolonyalist da ye û jî hemû mafên xwe yê neteweyî û demokratîk hatîye bêpar kirin. Herweha bi dereceyên jî hev cuda jî be, li seranserê Kurdistanê, polîtîka şer, îmha û înkare bi îsrar

têde domandin.

Parçeyê di nav tixûbên fermî yê Iraqa nû da, formekî nû wergirtîye: Di nav Iraqa Federal da, Kurdistan Federal. Lê belê, refat û pozîsyona hukûmeta Iraqa Federal ya merkezi ya "de facto" "antî Kurdistan" jî bo doza bi giştî ya Kurdistanê û mafên neteweyî Kurd, di nav xwe da potansiyela tehlîkeyê disitirîne. Lewma di vî warî da jî divêt hişyarîya neteweyî bilind bête girtin.

Di "stratejîya neteweyî" da pozîsyona dînamîkên navîn û derve:

Bi seferberkirina pêkve hêzên neteweyî û têkoşîneke bi rê û metodên meşrû yê polîtîk, rizgarkirina Kurdistanê û azadkirina neteweyî Kurd û xelkên Kurdistanê ji bindestê dijminên dagîrker û kolonyalist manaya "stratejîya neteweyî" îfade dike. Di tesbîtîkirina "stratejîya neteweyî" da xala bingehîn û tayînkê "berjewendiyên demokratîk yê neteweyî" ne. Bi navê xelkê Kurd û kêmaniyên di, hemû organîzasyonên sosyopolîtîk, sosyokultûrel û sosyoekonomîk yê neteweyî, kesayetiyên polîtîk û ronakbîr, "wekî hêza mezin ya neteweyî", terkîba civakî ya "stratejîya neteweyî" pêktînin.

Hêzên navneteweyî jî, polîtîkên xwe yê li ser Kurdistanê, "dîrekt" an "îndîrekt", li goreyî berjewendiyên xwe yê jostratejîk di rê dibin. Li ber vê rastîyê, divêt balansa reelpolîtîka cihanê li ber çavan bête girtin û jî bo xizmeta berjewendiyên neteweyî û aşîya rojhilatnavîn, hisaba "tifaqên pîralî" bête kirin.

Pozîsyona dewletên dagîrker:

Dewletên dagîrker li goreyî berjewendiyên xwe yê dewletî, dijî hevdu di nav rekabet û rikeberîyê da ne. Belê li ser xalekê berjewendiyên wan hev digirin û bi hev ra hereket dikin. Ew jî Kurdistan û bizava neteweyî ya xelkê Kurd e. Dewletên dagîrker hem yêk bi yêk polîtîkên xwe yê dijî neteweyî Kurd pêktînin û di rê dibin, hem jî bi hev ra û bi koordine polîtîkên xwe yê hevpar yê dijî Kurd û Kurdistanê di pratîkê da bi cih tînin.

Pozîsyona neteweyî Kurd û xelkên Kurdistanê:

Dijî vê konseptê nû gelek normal û heq e ku dînamîkên neteweyî jî divêt di çarçoveya berjewendiyên neteweyî da bi hev ra û bi koordine hereket bikin. Karekterîstîkên "parçeyî" hêj bi timamî ranebûne, lê zêf bûne. Digel hindê, dewletên dagîrker van tixûbên di nav xwe da, dijî bizava neteweyî ya xelkê Kurd dibezîne. Divêt hêzên neteweyî yê Kurd jî beramberî vê polîtîka nû ya dewletên dagîrker, xwe li "tixûbên destkîr" negirin, tixûban bibezînin û piştevanîya hev bikin û di şkandina vî cepheyê dagîrkeran da, bi rengê enîya neteweyî têkoşîne bidin. Karekterîstîka nû ya şoreşa Kurdistanê ev e û divêt li goreyî vê konseptê nû bête hereket kirin.

Li milê di, neteweyî Kurd di nav proseseke şoreşê da ye. Karekterîstîka şoreşa Kurdistanê neteweyî û demokratîk e. Neteweyî Kurd dijî van dewletên dagîrker, li milekê têkoşîneke neteweyî dide, li milê di jî di nav civata xwe da jî bo bi cih kirina sistemê demokratîk xebatê dike. Di vê konseptê neteweyî da, bask û çeperên dînamîkên şoreşa neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê fireh in. Hemû çin û navçin, grûb û kategoriyên civatê yê dijî sistemê dagîrker û kolonyalist, di armanca şoreşa neteweyî da tifaqdar in. Armanca ku hemûyan digihîne hev; rizgarîya Kurdistanê û azadîya neteweyî Kurd e. Di vê armançê da cihê kêmaniyên di yê Kurdistanê, (Asûrî, Ermenî, Cihû, Erebb, Tirkmen, Azerî û Tirk) jî heye. Ew jî tifaqdarên neteweyî Kurd in û azadî û rizgarîya wan jî bi azadî û rizgarîya neteweyî Kurd ve girêdayîye. Lewma dijî vî sistemê hov yê kolonyalîzmê, divêt pêkve xelkên Kurdistanê bêne seferber kirin û organîze kirin. Berjewendiyên wan Kurmîyan di hilweşandina sistemê kolonyalist da yêk e û divêt di nav esprîya cephegirîya neteweyî da hev bigirin û hêzên xwe bikin yêk.

Biryara mafê çarenivîsa neteweyî:

Di merheleyên şoreşê da, li goreyî rewş û konjonktura navxweyî û ya derve, li goreyî hêz û şîyan û îmkanên neteweyî dikare ihtimalên kêman zêde jî hev cuda derkevîne pêşîya bizava neteweyî ya xelkê Kurd û Kurdistanê. Mafê neteweyî Kurd e ku biryara "tayînkirina çarenivîsa xwe" bi xwe bide. Ewe dikare otonomî, federalîzm, konfederalîzm û serxwebûn be. Di têkoşîna bidestxistina van armancan da, mafê xelkê Kurd heye ku her reng parastina rewşa bi kar bîne. Xelkê Kurd herwisa di têkoşîna azadî, wekhevî, dad û dadyariyê da terore red dike û bi hemû peymanên navneteweyî yê mafên mirovî ve girêdayîye.

Di têkoşîna neteweyî da pozîsyona stratejîk:

Hêz û dînamîkên neteweyî divêt di van xalan da beramberî hevdu bi

biryardarîyeke bilind berpirsiyar bin:

1. Berjewendiyên neteweyî yên demokratîk divêt di serê her tiştî da bêne girtin.
2. Hebûnên neteweyî divêt bêne parastin û lê xwudan derkevin û rêz li simbolên neteweyî bête girtin.
3. Di têkoşîna dijî dewletên dagîrker û kolonyalist da, li ser hisaba rêxistinên di yên neteweyî divêt nekevin nav hisabên teng û rêxistinî.
4. Digel rêxistinên neteweyî her bi çi rengî be di nav diyalogê da bin.
5. Piştewaniya hêzên neteweyî di dereceya herî bilind da bête ragirtin.
6. Kerkûk û hemû tixûbên Kurdîstanê beramberî dagîrkeran her bi çi metodî be bi hev ra bêne parastin.
7. Şerê di navbeyna hêzên neteweyî da, wekî sûcê neteweyî bête qebûl kirin.
8. Her kijan hêza neteweyî li ser têkçûna hêzeke di ya neteweyî bikeve nav pratîkeke şaş, divêt wekî alarmeke sor bête qebûl kirin û beramberî vê jî rêya neteweyî derketinê, hemû dînamîkên neteweyî di nav alarmê da bin û refleksa parastina berjewendiyên neteweyî bi rengêkî aktîv û lêveker nîşan bidin û rê li ber şkestina navxweyî ya neteweyî bigirin.
9. Ji bo ku yekîtîya neteweyî ya demokratîk mayînde bibe, divêt organizasyonên wekî meclis, platform, kongre û yên di bêne pêkînan.

Kombûna mezin ya KNKYê ya II.

(Civata giştî ya 8an)

24 Hezîran 2008, Bruksel

[KNK Bulten, hj. 6, Teşrîn (Mijdar) 2008]

KNKYê ji bo mezinên dinyayê nameyên

li ser problema ziman û perwerdeya

Kurdî û rewşa Abdullah Ocalan rêkirin.

Bersivên nameyan hatin. Ji wan bersivan sê nimûneyan li jêr didin:

Bo Mezinên Dinyayê Name

Bi armanca piştewaniya bizava "Perwerdeya Kurdî" li Tirkîye û Kurdîstanê, bi însiyatîva "Komisyona Ziman û Perwerdeya ya KNKYê" nameyek hate amade kirin û gelek rêxistin û nivîskar û ronakbîrên Kurd îmza kir û bo van navên li jêr hate rêkirin:

Bo birêzan,

Ban Ki-Moon, Sekreterê Giştî yê UNê

Carol Bellamy, Direktora UNICEFê

José Manuel Barroso, Serokê Komisyona EUYê

Nicolas Paul Stéphane Sárközy de Nagy-Böcsa, Serokkomarê Fransayê û serokê demî yê EUYê

Nancy Patricia D'Alesandro Pelosi, Seroka Meclisa Nimayendeyan [Kongre] ya Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê [USA]

"... 25 milyon Kurd li Tirkîyeyê ji perwerdeya bi makzimanê xwe mehrûm in; ma eve ne şerma mirovahîyê ye?.."

19 Îlon 2008

Bi navê Sarkozî, şefê kabîneya serokkomarî bersiva nameya KNKYê da, li jêr e:

Birêz Rojan Hazim,

Serokê Komisyona Ziman û Perwerdeya ya KNKYê

Paris, 6ê Teşrînê 2008

Serokkomarê Komara Fransayê nameya we wergirt. Di nameyê xwe da hûn piştewaniyê dixwazin daku Kurdên li Tirkîyeyê bişên perwerdeya bi zimanê xwe bibînin.

Birêz Sarkozy ev wêzîfe da min ku ez we emîn bikin ku ew jî dê li ser

karê we hişyar be.

Wezaretê Karê Derve jî li ser vê pirsgirêkê hatîye agahdar kirin.

Birêz serok, tikayê dikim ku silavên min yê gerim qebûl bikin.

Cédric GOUBET, Şefê Kabîneya Serok Komarê Fransayê

Komisyona Ziman û Perwerdeya ya KNKYê, digel Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, li 12ê

Çileyê 2007ê, sempozyumek amade kir.

Sempozyum bi program, mijar, beşdar

û konklusyonê li jêr, bi serkevî xilas bû.

Yekîtîya Ewrûpayê bersiva konklusyonê

sempozyumê jî bi fermî da.

Nameya YEYê jî li jêr e:

Konklusyonê sempozyumê

"Sempozyuma li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî", di roja 12yê meha çileyê ya sala 2007ê da, li Brukselê li avahiyê Parlemanta Belçîkê pêkhat û ev konklusyon pêşkêşî YEYê û bir û rehiya giştî kir.

Sempozyum bi berfirehî li ser pîrsa bi giştî rewşa zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî ya li nav tixûbên fermî yê Tirkîyeyê û Ewrûpayê rawesta. Ji axivtin, pêşkêşî û riberizên sempozyumê derkeke meydanê ku zimanê Kurdî hem di warê axivtinê da, hem jî di warê nivîsîn û perwerdeya da li Tirkîyeyê di dereceya man û nemanê da ye. Ev rewşa trajîk jî bi tîmamî jî ber polîtîkên asimilasyona sistematîk ya dewleta Tirkîyeyê pêkhatîye. Beşdarên sempozyumê bi vekirî destnîşan kirin ku heke dewleta Tirkîyeyê, di van polîtîkên xwe yê asimilasyonîst da îsrar bike, dê adeta jenosîdeke zimanî derkeve meydanê. Sempozyumîstan di danezanên xwe da gotin ku zimanek heke di nav sîstemê perwerdeya dewletî da neyete bi kar înan, ew ziman pêşnakeve û ber bi mirinê ve diçe. Lewma gelek bi giringî li ser perwerdeya bi zimanê Kurdî hate rawestan û bangî dewleta Tirkîyeyê hate kirin ku rojek zûtir sîstemê perwerdeya xwe ya dewletî li goreyî xwastekên xelkê Kurd ji nû ve plan bike û ji dibistana seretayî heta unîversîteyê Kurdî li tenîştê Tirkî, fermiyên bête bi kar înan.

Sempozyum herweha li ser rewşa negatîv ya perwerdeya Kurdî li welatên Ewrûpayê jî rawesta û bangî YEYê kir ku daxwaza Kurdên li nav cografîyaya YEYê jî bîne cih û perwerdeya zimanê Kurdî di dibistanên dewletê da bide kirin.

Sempozyumê herweha bangî Yekîtîya Ewrûpayê jî kir ku pîrsa perwerdeya bi zimanê Kurdî sist negire û bi micidahi li ser raweste û fişarê ji ser serê dewleta Tirkîyeyê sist neke.

YEYê hewce ye bi Tirkîyeyê bide zanîn ku yêk ji esasên "Kriterên Kopenhagê" jî ew e ku her xelk bi zimanê xwe bête perwerde kirin û ev erk jî yê dewletê ye.

Di sempozyumê da herweha hate gotin ku makqanûna Tirkîyeyê astenga herî mazin e û divêt bête guhorîn. Bi taybetî du maddeyên makqanûnê hatin destnîşan kirin ku lezînen divêt bêne rakirin. Maddeyê 3yê û maddeyê 42yê astengên herî mezin in li pêşîya perwerdeya bi zimanê Kurdî. Bang li YEYê hate kirin ku di vî warî da aktîv be û van maddeyên makqanûnê behemehal bide rakirin û binaxeya qanûnî ya perwerdeya bi zimanê Kurdî bi Tirkîyeyê bide amade kirin.

Ji Komisyona YEYê ev daxwaza kurt û konkret hate kirin:

Perwerdeya bi zimanê Kurdî divêt li tenîştê zimanê Tirkî, di nav sîstemê perwerdeya dewletê da fermiyên bête dan. Ji ber hindê, tika ye, pîrsa "Perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî" danin serê rojeya gotûbêjên xwe yê digel dewleta Tirkîyeyê. Du maddeyên asteng yê makqanûna Tirkîyeyê, md. 3 û md. 42, ji makqanûnê bidine rakirin.

12ê Çileyê 2007ê, Bruksel / [KNK Bulten, hj. 2, Adar 2007]

Konklusyona sempozyumê, 19 Çile 2007ê, bi nameyekê ve bo YEyê hate şandin. Bersiva YEyê li jêr e:

Ji Komisyona Ewropayê
Direktorata Giştî ya Firehbûnê

Bo Birêz Rojan HAZIM
Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Jean Stasstraat 41
1060 Bruksel

Bruksel, 02 Sibata 2007
ELARG CD reg D(2007)100482

Birêz Hazim,

Bi daxwaza Mr. Rehn ez bersiva nameya we ya 19yê Çile 2007 ya li ser Sempozyuma zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî didim.

Pirsgirêkên ku we fokus înyar ser gelek giring in. Di raporên xwe û di gotûbêjên me yê digel dewleta Tirkîyeyê da em jî li ser sekinîn. Di rapora pêşveçûnê da ya Komisyonê li 2006ê me nivîsî ku zarokên li Tirkîyeyê ku makzimanê wan ne Tirkî ye, nikarin bi makzimanê xwe perwerdeyê wergirin di nav sîstemê perwerdeyê yê fermî yê dewleta Tirk da. Herweha me nivîsî ku perwerdeyê wisa tinê di nav çarçoveya mektebên prîvat da heye. Lê belê hemû kursên li ser zimanê Kurdî li 2004ê hatin girtin. Lewma vê gavê çu îmkanê Kurdî fêrbûnê di sîstemê perwerdeya fermî anjî ya prîvat da nîne.

Em van mewzûyan digel dewleta Tirk riberiz dikin, daku Kurd bigihine îmkanên wekhev yê fêrbûna zimanê xwe û perwerdeya bi zimanê xwe.

Digel silavan,

Christian Danielsson,
Serokê Unitê

[KNK Bulten, hj. 2, Adar 2007]

Nameya KNKyê bo serokan:

Konseya Rêvebir ya KNKyê, di kombûna xwe ya 8ê Adarê da biryar da ku li ser rewşa Ocalan nameyekê bo Yekitiya Ewropayê [YE], bo serok dewlet û serok wezîran û herweha bo organîzasyonên xêrxwaz û humanîter bişînin. Li jêr bersiva hatiye dan didin.

Not:

Name ji bo serokwezîrê Slovenyayê hate şandin ku Slovenya ji serê sala 2008ê heta dawîya Hezîrana 2008ê seroka Yekitiya Ewropayê [YE] ye. Berpirsiyara ofîsa serokwezîr name ji bo ku li ser bête rawestan, bi agahdarîyê kurt, şande wezareta karê derve ya hukûmeta xwe û nimûneyek ji wê namekê jî bo KNKyê şand. Li jêr wê "talîmata" serokwezaretê jî didin.

Komara Slovenya
Ofîsa Serokwezîr

No: 511-3/2008
18ê Adarê 2008

Bo
Wezareta Karê Derve
Ofîsa Wezîr
gp.mzz@gov.si
Mijar: Girtiyê politîk Abdullah Ocalan

Birêzan,
Buroya serokwezîr nameyek ji Konseya Rêvebir ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê wergirt. Di nameyê da ji serokwezîr Janez Jansa, ku wekî

serokê YEyê ye, tete xwastin ku rewşa girtiyê politîk birêz Abdullah Ocalan di ber çavan ra bête derbaz kirin. Birêz Abdullah Ocalan li girtixaneyê di giravê Imraliyê da girtiyekî bi tinê ye û cizayê muebbetê dikêşe.

Di nameyê da li ser rewşa xirab ya wî û bi taybetî li ser îzolasyona mezin ya sosyal û qebûlnekirina tewsiyeyên CPTyê ji teref hukûmeta Tirkîyeyê tete behs kirin.

Xwasteka me ew e ku hûn vê serlêdanê analîz bikin û li goreyî wê hareket bikin.

Spas ji bo bi hev ra karkirina we.

Digel rêz û silavan.

Nika Dolinar Divjak,
Seroka Ofîsa Serokwezîr

Ji rapora Konseya Rêvebir ya KNKyê

"... Dewletên dagîrker digel hev "tixûban dibezînin" û bi hev ra û bi koordine şerê xelkê Kurd dikin. Li ber vê rastiyê, gelek normal e ku divêt dînamîkên neteweyî yê xelkê Kurd jî bi hev ra çeper bigirin dijî vê alyansa bêyûm ya dewletên dagîrker. Belê mixabin ku li pêş vê tehlîkeya mezin çeperê neteweyî belav e û dijmin istifadeyekî mezin jî vê yekê dike. Li milekê tifaqa dewletên kolonyalist û dagîrker heye û gelek aktîv e, li milê dî enîyêke neteweyî ya Kurdistanê nîne. Ewe paradokseke trajîk e û divêt her bi çî rengî be ji halê bête rakirin û ev valahîya beramberî cepheyê dijmin bête tîjî kirin. KNK ji destpêka avabûna xwe heta îro îşaret bi vê yekê dike, lê mixabin ku di vî warî da gavên hevîdar nayê avêtin. Digel vê reftara negatîf ya navxweyî jî, em geşbin in û me bawerî bi hêza xelkê xwe heye ku dê fişarê bine ser hêzên pêşeng ku jî ji vî şaşîya xwe vegerin û zûtirîn dem cepheyê neteweyî vehûnin û her bi çî rengî be tifaqêke neteweyî ava bikin. Mîsyonê KNKyê pêkînan tifaqa neteweyî ye û em dê hewildanên xwe bi îsrar bidomînin. Em jî di vê pîrsê da bi slogana îro gelek aktuel û popûler "êdî bes e" dibêjin bo vê xemariya Kurdan ya di derheqê yekitiya neteweyî da û banga xwe dubare dikin ku rojek zûtir reng û metodên avakirina yekitiya neteweyî peyda bikin û di pratîkê da jî bi cih bikin. Şkandina çeper û cepheyê dijminan li çaralî, bi avakirina çeper û cepheyî yê neteweyî mumkun dibe. Em herkesê di vî warî da gazî berpirsiyariyê dikin..."

21-22 Hezîran 2008, Bruksel /

[KNK Bulten, hj. 6, Teşrîn (Mijdar) 2008]

Paragrafêk ji nivîsa "KNK û lezîniyeta tifaqa navxweyî ya Kurdan"

.... KNK bi hebûna xwe ve çeperêk saxlem yê bizava neteweyî û demokratîk ya xelkê Kurd û Kurdistanê ye. Dijî enîya bêyûm û minafiq ya dewletên kolonyalist û dagîrker yê wekî Tirkîye, Îran û Sûriyeyê, enîya pîroz ya hemû hêz û kesên neteweyî yê Kurdistanê disa ve KNK ye û divêt ev çeperê neteweyî bête xurt û saxlem kirin. Mîsyonê KNKyê pêkînan tifaqa herî fireh ya neteweyî ye. KNK bi bang û gazîya pêkînan tifaqa neteweyî jî dil e û di nav çu hisabên biçûk yê politîk û rêxistinî da nîne. KNK li muştêreka asgarî ya neteweyî digere. Di şertên heyî da, di konjonktûra îro da ev muştêreka asgarî, dijî kolonyalizm û dagîrîyê û enîya wan dewletên dijmin, pêkînan tifaqa herî fireh ya neteweyî ye. KNK di gava lezîna da jî qet nebe li tîkilî û diyaloga neteweyî digere û dixwaze di gava pêşîn da disa ve qet nebe koordînasyonêke neteweyî pêkbêt ku eve jî dê bibe gaveke saxlem ji bo avakirina hevîrtîneke pahn û berîntir ya neteweyî. KNK ne qadîrî mutleq e, ne dogma, ne jî tabû ye û herweha ne mekanîzmeyeke mekanîk û statîk e ku guhorîn anjî nûvebûn lê neête kirin. KNK di nav prosesa firehbûna tifaqa neteweyî da dikare her reng û formekî nû werbigire. Ya rast û giring ew e ku terkîbê bête firehtir û zengîntir kirin. Gavên dî dikarin di nav sîstemê demokratîk yê

navxweyî da çareser bibin û KNK ji bo vê yêkê vekirî ye. Tête hevî kirin ku ev daxwaz û xwezî û hêviya KNKyê şaş neête mana û tercume kirin. KNKyê per û baskên xwe, der û pencereyên xwe ji bo hemû elementên neteweyî heta dawîyê vekirine. Kombûna giştî ya 6. ya KNKyê, [13 – 14 Gulan 2006, Bruksel], eve bo xwe kirîye parola û ji ber vê yêkê jî hem ji aliyê programatik ve, hem jî ji aliyê mekanizma û sistemî ve reformasyoneke pêdivî û pêşve pêkînaye. Bi hêviya ku bîr û bawerî û nêrîn û refara ku bo xwe tifaqa neteweyî kirîye armanc, serbikeve.

ROJAN HAZIM

Gulan 2006

[Ji KNK Bulten, hj.1, Kanûn 2006]

**

Ji bo bîr û rehîya giştî

Serokê rûmetê yê KNKê birêz Abdullah Öcalan, di hevdîtînen dawî de jî parêzerên xwe re, problemên tenduristîya xwe cara yêkêmin e ku bi awayekî ciddî tîne ziman û ji wan bi israr dixwaze ku li ser tenduristîya wî bisekinin.

Li ser navê Konseya Rêvebir ji berpirsaryên Dewleta Tirk re bang dikin : Tenduristîya birêz Öcalan, tenduristîya Gelê Kurd e. Eger ji bo tenduristîya gelê me xeter çêbe, eva tê wê wateyê ku tenduristîya Tirkîyeyê jî dê di bin xetereke mezin de bimîne.

Birêz Öcalan miftaya aştî, demokrasi û îstîkrara Tirkîyeyê ye. Pêwîst e berpirsaryên Tirkîyeyê li goreyî wê rastîyê nêzikî birêz Öcalan bibin, ji bo parastin û tedawîya wî çî pêwîst e pêk binin û di derbareyê tenduristîya wî de, Gelê Kurd û raya giştî di demekî nêzik de agahdar bikin.

Konseya Rêvebir ji gelê me re jî bang dike ku ji bo tenduristîya serokê neteweyî birêz Abdullah Öcalan hişyar û amade bin.

Remzî Kartal

Berdevkê Konseya Rêvebir ya KNKê
Bruxelles, 11. 08. 2003

**

Di mîdehê deh salan da gelek konferans û sempozyum ji teref KNKyê ve hatine kirin. Çendek jê ev in:

Çareserîya Doza Kurd di prosesa nû ya Rojhilata Navîn da

Di vî demî de ku li Rojhilata Navîn û Kurdistanê guhertînen giring pêktên, li ser banga Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK], jî her çar parçeyên Kurdistanê, Ewropa û Amerîka, ji sedî bêtir nûnerên partî, rêxistin, sazî, dezgehên Kurdistanî û kesayetîyên serbixwe di rojên 20 – 21.06.2003an, li bajêrê Amsterdam – Hollanda, di **Konferansa Çareserîya Doza Kurd Di Prosesa Nû Ya Rojhilata Navîn De** kom bûn.

Heya niha gelê Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê [Tirkîyê, Îranê, Îraqê û Sûriyê] jî bo azadî, standina mafên xwe yê rewa û pêkanîna guhertînen demokratîk li wan welatan ked û têkoşîneke mezin daye û hê jî dide. Bi vî awayî êdî gelê Kurd li herêmê bûye faktorekî giring jî bo guhertin, çareserî û demokrasiyê. Li hember vê yêkê, rêjimên van welatan di statukoya heyî de sîr û bi israr in û ji bo çareserîyê nebûne xwedan gavên berbiçav û ciddî.

(....)

Li ser vî bîngêhî konferans van xalên jêrîn dîyar dike:

- Konferans ji hêzên hevpeyman daxwaz dike, ku doza gelê Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê wek dozeke neteweyî giştî yêk bibînin û li ser bîngêhî demokrasiyê piştgirîya çareserîyêke dadmend bikin.

- Konferans ji Neteweyên Yêkgirtî, Yekîtiya Ewropa û sazîyên navneteweyî dixwaze, ku statuya federal ji bo Başûra Kurdistanê bi fermî bê nas kirin.
- Konferans ji hemû dewletên desthilatdarên Kurdistanê dixwaze, ku hemû derfetên pêwîst bide Kurdên hemû parçeyan ji bo ku di nav xwe de têkilîyên aborî, çandî û civakî pêşve bibin û xurt bikin.

Konferans bang li partî, rêxistin, dezgeh û tevayî gelê Kurdistanê dike:

- Konferans gazî hemû partî, rêxistin, dezgeh û herweha pêkve gelê Kurd dike, ku li ser bîngêhî demokrasiyê rêzên xwe têkûz bikin, hevkarî û yêkgirtîna neteweyî pêkbînin û wê derfeta dîrokî ji dest xwe bernedin.
- Hevkarî û xebata hevbeş ligel hêzên demokratîk yê gelên Rojhilata Navîn bikin.
- Demokratîzekirina civaka Kurdî bi hêzkirina rola jinan, ciwanan û rola medya azad bikin armanca bîngêhî.
- Hevkarî û hevpeyman ronakbîrên Kurd, ji bo xurtkirina pêwendîyên çandî, li ser bîngêhî civaka demokrat û azad divêt bê xurt kirin.

Ji bo Başûra Kurdistanê:

- 1) Konferans piştgirîya avakirina Îraqeke federal û demokratîk dike, ku azadî, demokrasi û mafên mirovan digel hemû rengên neteweyî, civakî, dînî û hwd, di destûra bîngêhî de bî çespanî û parastin.
- 2) Konferans piştgirîya xurtkirina rola jinan di guhertin û rêvebirina civakê de dike û herwisa gazî tevgerên jinan li Kurdistanê dike, ku di wê prosesê de bi çalakî beşdar bibin.
- 3) Konferans bang li gelê Kurd bi giştî dike, ku li serketin û destkeftên Başûr xwedan derkeve û biparêze.
- 4) Konferans bang li hemû hêz û partîyên Başûr dike, ku alîkarî û piştgirîya têkoşîna gelê Kurd, li parçeyên dî yê Kurdistanê bike.
- 5) Konferans piştgirîya hewldanên hêzên hevpeyman ji bo avakirina Îraqeke federal û demokratîk dike.
- 6) Konferans piştgirîya xurtkirina rola Parlemeta Kurdistanê li Başûr û yêkkirina hukûmeta herêma Kurdistanê dike.

Ji bo Rojhilat:

- 1) Gelê Kurd li Rojhilat wek gelên dî di navçeyê de bi guhertînen dîrokî re rû bi rû ye. Ji ber wê pêwîst e gel bi damezrandina sazî û dezgehên siyasî, kulturî û civakî û bi rêya diyalog bi gelên dî yê Îranê re ji bo demokratîzekirina welat û çareserkirina pîrsgirêka Kurd gavan biavêje.
- 2) Konferans bang li hemû hêzên siyasî yê li Rojhilata Kurdistanê dike, ku di platformeke neteweyî û demokratîk de ji bo bîdestxistina armancên gelê Kurd hevdu yêk bigirin û ji bo çareserîyê projeyêke hevbeş amade bikin.
- 3) Konferans pêkanîna operasyonên leşkerî yê ertêşa Îranê ku ligel rejîma Tirkî li dijî gerîlayên Hêzên Parastina Gel (KADEK) û desttêwerdana vî welatî di Başûr de bi tundî mehkûm û şermezar dike.

Ji bo Bakur:

- 1) Konferans bang li dewleta Tirk dike, ku dest ji polîtîka xwe ya inkar û îmhayê berde û ji bo çareserîyê bi nûnerên gelê Kurd re têkeve nava diyalogê.
- 2) Divêt di destûr û qanûna bîngêhî de nasname, ziman, mafên siyasî, civakî, çandî û aborî yê gelê Kurd bêne tespît kirin û çespanî.
- 3) Konferans ji bo “Kampanyaya Çareserîya Pîrsgirêka Kurd” li ser bîngêhî aştîya civakî û tevlebûna demokratîk, ku niha li bakur tête meşandin, piştgirîyê dike û gazî hemû gelê Kurd dike, ku tevli wê kampanyayê bibin.
- 4) Konferans êriş û operasyonên dewleta Tirk li ser gel û hêzên Kurdî, şermezar û mehkûm dike.
- 5) Konferans êrişê desthilatdarên Tirkîyeyê li ser rûmet û payedariya mirovên Kurd û bi taybetî şikandina rûmeta jinên Kurd bi tundî mehkûm dike.

Ji bo Başûra Rojava

- 1) Konferans bang li hemû partî û rêxistinên Kurdî li Başûra Rojava dike, ku di vî demê dîrokî yê giring de hemû nakokîyên xwe deynin aliyekê û hevgerîneke neteweyî li vî beşê welat pêkbînin.
- 2) Konferans zor û pestana rejîma Sûriyeyê ya li ser gelê Kurd, girtina siyasetmedar û demokrasiyxwazên Kurd û herweha spartina çalakvanên siyasî bo rejîma Tirkîyeyê şermezar û riswa dike.
- 3) Konferans dibîne, ku çareya herî baş di vî demê de ew e, rêjîma Sûriyeyê daxwazên demokratîk û rewa yê gelê Kurd bipejirîne û

pêkbîne; bêyî pêkanîna demokrasîyê li seranserê Sûriyeyê û çespondina mafên gelê Kurd di destûra bingehîn de, pirsgirêk çareser nabin.

**

KNKyê hîlbijartina Barack Obama pîroz kir

Bo bîr û rehîya giştî,

Em li ser navê KNKyê, hîlbijartina birêz Barack Obama bo serokatîya Emerîkayê pîroz dikin.

Em hêvîdar in ku ev hîlbijartin wekî ku birêz Obama gofî, ji bo Dewletên Yêkbûyî yê Emerîkayê [DYE], rojhilata navîn û hemû cîhanê bibe demê guhortinê.

Herweha em hêvî dikin ku di vî demê nû da, pirsgirêkên di nav xelkan da li ser bingehê dîyalog û aştiyê bêne çareser kirin, demokrasî û azadî di hemû cîhanê da bibe biha û armancên esasî.

Ji bo çareserîya pirsgirêka Kurd jî di vê çarçoveyê da em hêvîdar in ku birêz Obama di sîyaseta Emerîkayê da guhortinê pêkbîne.

Herwisa hêvî dikin ku sîyaseta Emerîkayê ku PKK wekî dujminê Emerîka îlan kiribû, bête guhortin. Ji ber ku gelê Kurd û PKK, ne ji gelê Emerîkayê ra û ne jî ji bo gelekî dî ne dijmin e. Çareserîya pirsgirêkan ne li ser bingehê dijminatîyê ye, li ser bingehê dîyalog û aştiyê ye.

Em wekî KNK hêvî dikin ku birêz Obama bo parastina destkeftên Kurdan yê li başûra Kurdistanê û hemû deverên Kurdan roleke baş û bixêr bileyîze.

KNK bi vê hêvî û bawerîyê careke dî birêz Obama pîroz dike û di demê nû da jê ra serkeftinê dixwaze.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]

5 Teşrîn [Mijdar] 2008, Bruksel

[KNK Bulten, hj. 6, Teşrîn (Mijdar) 2008]

**

Belavoka encamê ya „Konferansa Jinan ya KNKyê“:

“Jin Jîyan e, Jîyanê nekuje”

Konferansa jinan ya ku di peşengîya komisyona jinan ya KNKyê da hatîye organîze kirin, bi beşdarîya 50 jinên ji sazî û rêxistinên cuda hatî û ronakbîran, di navbeyna 30.06 - 01.07ê 2007 da bi şiyara **“Jin Jîyan e, Jîyanê nekuje”**, pêkhat. Ji her çar parçeyên Kurdistanê û dîasporayê jin beşdarî konferansê bûn. Konferans wekî platformeke nêrînên cuda yê li ser pîrsa jinê hate îfade kirin. Di konferansê da şiddeta ku dewlet, civak û malbat li ser jinan dikin, bi kûrahî hate riberiz kirin (munaqeşe kirin) û bi xurtî hate şermizar kirin. Di riberizan da hate dîyar kirin ku jin li kî derê be bila bibe, pirsgirêkên jinên Kurd hevbeş in û di her alî da tene tepisandin. Lê herçiqas ji bo neteweyîyê kar bête kirin jî, heta ku jinên Kurd mafên xwe bi dest nexin, civaka Kurd ji zihniyeta babşahî rizgar nabe. Bi civakeke paşketî û di bin tesîra dewletên serdest da mafên jinan çu caran nayên bi dest xistin. Di pêşxistin û guhortina civak û sistemê dewletên serdest da divêt jin pêşengîyê bikin.

Herçend jinên Kurd di bin hakimîyeta dewletên cuda yê kolonyalîst da û herweha li Kurdistanê Federal jî bijîn, lê rengê eşên jinan nayê guhortin. Ji ber ku welatek azad jî bibe nayê wê manayê ku pirsgirêkên jina çareser dibin û jin jî azad dibin. Sistemê mêrşahiye xwe di hemû saheya jîyanê da bi cih kirîye û jin di bin barê giran yê jîyanê da tene fetisandin. Jin ne xwedî vîna xwe ya azad in. Jin ji ber ku baş ne bi rexistin in, li beramber edetên kevn û qanûnên li dijî wekhevîya jin û mêran nikarin derbikêvin û ji bin barê giran nikarin rabin. Herweha di derbareyê mafên xwe da, xwe bi zanîyarî perwerde nekirine. Wekî çare dawîyê bi jîyana xwe tînin. Bêşik herçend xwe kuştin di aliyekê da wekî neqebûlkirina jîyana koletî bête biha kirin jî, lê baş tete zanin ku li beramber şiddetê, xwekuştin ne çare ye û ev yêke, lawazîya jinan nîşandide. Jina ku cesaret dike ku xwe bikuje, cesareta wê heye ku li beramber jîyana koletî jî derbikêve. Di aliyekî di da herçend ji bo mafên jinan qanûn bêne guhortin jî, dîsa mafên jinan nayên parastin. Ji ber ku di nav civata Kurd da, ji aliyê jîyana jinê ve, mixabin ku tesîra edetên kevnare û paşerû hêj jî bi zêdehî ve tete dîtin. Di civatê da bi giranî jin wekî malê mêran tete dîtin. Û di bin navê parastina şerefa mêran da kuştina jinan hindî hûn bêjin zêde ye. Anku ji bo ku mêr nekevin zindanê jin mecbûrî xwekuştinê tene kirin.

Divêt jin di her alî da xwe bi hêz bikin, ji ber ku xebata azadîya jinan gelek zehmet e. Di vê xebatê da jî, jin li şûna ku ji dewletan, ji mêran hêvî û daxwazan bikin, divêt bi keda xwe xebata azadîya xwe bimeşînin. Herweha divêt ku ew zihniyeta mêrşahiye, ku dibe sebebê kuştin û xwekuştina jinan, bête kuştin. Ji bo ji halê rakirina vê zihniyetê û guhortina qanûnên dijî jinan, yekitiyeke xurt pêwîst e. Têkoşînen yêkekesî encam nagirin. Di her alî da avakirina rêxistin û sazîyên jinan û hevkarîya wan ya bi hevdu ra, dê hêza guhortinê jî bi xwe ra bîne. Li kî derê li jinekê neheqîyek bête kirin, divêt her jinek wê neheqîyê wekî ku li wê hatibe kirin bibîne û helwesta xwe nîşan bide.

Em bawer dikin ku ev konferans jî bo hingavên hêj mezintir dê bibe bingehêkî xurt. Herweha vê konferansê, hêvîya jinên Kurd, ya di derheqê avakirina yekitiya neteweyî ya demokratîk da, geştir û mezintir kir. Em hêvîdar in ku di rojên pêşiyê da, bi organîzasyonên hêj berfirehtir li Kurdistanê bigihin hevdu.

30 Hezîran – 01 Tîrmeh 2007, Elmanya

[Ji KNK Bulten, hj. 3, Tîrmeh 2007]

„Konferansa Jinan ya KNKyê“

Komisyona Jinan ya KNKyê, di rojên 30ê Hezîranê û 1ê Tîrmehê da li Elmanya, bi slogana “Jin Jîyan e, Jîyanê Nekuje”, “Konferansa Jinan ya KNKyê” pêkîna. Ji herçar parçeyên Kurdistanê û meydanan dîasporayê gelek jinên Kurd beşdarî konferansê bûn. Konferansê bi axivtina nûnera “Komisyona Jinan ya KNKyê” û serokê KNKyê Elî Egîd dest bi xebata xwe kir. Konferans bi vê programê pêkhat:

Konferansa Zimanê Kurdî

KNKyê di 14-15ê Gulana 2008ê da, bi munasebeta “Cejna Zimanê Kurdî”, “Konferansa Zimanê Kurdî” pêkîna. Ev konferans û bi terkîb, naverok û encamên xwe ve giring bû û roleke di senga xwe da leyist di warê ziman û perwerdeyê da. Herweha ev konferans yêk ji aktivîteyên giring û balkêş yê di nava deh salên KNKê da bû. Lewma li jêr daxuyanîya encamê dubare diweşînin:

Konferansa Zimanê Kurdî pêkhat

Komisyonê Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê, di kombûna xwe ya 8ê Tîrmeha 2006ê da, biryar dabû ku konferanseke li ser zimanê Kurdî pêkbin. Piştî amadekarîyên berfireh, konferans di 14-15ê Gulana 2008ê da bû qismet ku pêkbe. Konferans digel Instîtûta Kurdî li Elmanya hate organîze kirin. Ji bo konferansê rojev û programeke rêkûpêk hate amade kirin. Ji başûr, bakur, rojhilat heta başûrarojava û meydanên dîasporayê bispor û zanayên li ser zimanê Kurdî hatin vexwandin. Armanca konferansê ew bû ku, pirs û pirsgirêkên zimanê Kurdî di çarçoveya zanyarî da rayêxe ber çavan û gotûbêj û riberizên berwer li ser ziman bide kirin û encameke bikêr derêxe meydanê ku di pratîkê da bête bi kar inan. Konferans bi munasebeta "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" hate organîze kirin û di roja cejna zimanî da dest pê kir. Bi taybetî ji Kurdistana Federal grûbeke xurt bi hejmareke bilind beşdarî konferansê bûn. Ji unîversîteyên Hewlêr, Silêmanî, Kerkûk û Duhokê profesor, doçent û lektor, gelek akademîsyen beşdar bûn. Herweha nivîskar, rojnamevan û weşanger jî beşdar bûn.

Daxuyanîya "Konferansa Zimanê Kurdî" ya li Berlînê:

"Konferansa Zimanê Kurdî" di roja "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" da, du roja, di 14 – 15ê Gulanê da li avahiyê Parlemanta Eyaleta Berlînê li Salona Kulturê pêkhat. Ji hemû parçeyên Kurdistanê û dîasporayê nivîskar, akademîsyen û ronakbîrên Kurd beşdar bûn. Di konferansê da pirs û pirsgirêkên zimanê Kurdî bi giştî û berfireh hatin axivtin, gotûbêj û riberizên berwer li ser hatin kirin. Di encam da hewce hate dîtîn ku ev daxuyanîye bête belav kirin.

1. Maka problemên zimanê Kurdî rewş û statuya dagîrî û kolonyal ya li Kurdistanê ye. Dewletên kolonyalist û dagîrker rengareng asteng, gir û giriftarî derêxistine pêşîya zimanê Kurdî. Bi taybetî Tirkîye û herwisa Iran û Sûriye jî, bi çu awayî rê nadin ku Kurdî bikeve nav sîstemê perwerdeya fermî ya dewletê. Ji xwe li bakur û Tirkîyeyê di warê axivtin û nivîsînê da, asîmilasyonê nedîtî di dereceya mirandinê da li ser Kurdî tete domandin. Dîsa xemsarîya navxweyî ya xelkê me jî wekî otoasîmilasyon encam dide û avê dikêşe ser aşê asîmilasyona dewleta Tirk. Lewma konferans ji bo her reng asîmilasyonê dibêje êdî bes e!
2. Konferans bang li van dewletên navkirî dîke ku zimanê Kurdî di nav sîstemê perwerdeya fermî da bi cih bikin û zimanê Kurdî bikine zimanê duyê yê fermî yê dewletê.
3. Konferans bang li bispor û zanayên zimanî yê Kurd dîke ku ji bo standrtkirina zimanê Kurdî û zaravayên Kurdî di nav kar û xebateke zanyarî û kolektîv da bin. Ji bo ku kar û xebatên li ser ziman bi aheng û berwer bêne kirin, ji bo ku pirs û pirsgirêkên zimanî bêne çareser kirin, ji bo ku hewcehiyên zimanî bêne dîtîn Akademîya Zimanê Kurdî bête avakirin.
4. Konferans ji bo paşeroja zimanê Kurdî û di hev gihiştina xelkê Kurd, şertekî jîyanî dizane ku alfâbeya Kurdî ya hemû zaravayan bibe yêk.
5. Konferans di wê bawerîyê da ye ku, li her parçeyê Kurdistanê, zaravayê ku bi nifûsa xwe ve piranî, bibe zaravayê giştî û zaravayê kêmanî jî di nav navçeya xwe da paralelî zaravayê piranî wekhev fermiyên bête bi kar inan û pir zaravayî ya zimanê Kurdî bête parastin.
6. Konferans herweha di wê bawerîyê da ye ku, garantîya paşeroja neteweyê Kurd bi parastina zimanî dibe. Lewma bi taybetî bang li xelkê Kurd yê li Tirkîye û bakura Kurdistanê jî dîke ku ji bo bi kar inana zimanê Kurdî bi berpirsiyarî rabin û dijî asîmilasyona dewleta Tirk zimanê xwe biparêzin.
7. Konferans bang li Yekîtîya Ewropayê [YE] dîke ku di prosesa endametiya YE ya Tirkîyeyê da fişarê li ser dewleta Tirk bike ku perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî bike nav sîstemê perwerdeya fermî û di makqanûna xwe da hilgire bin garantîyê.
8. Konferans ji bilî deklarasyona xwe ya bi pîrsa ziman ve girêdayî, dixwaze bangeke giştî ya neteweyî jî bide: Konferans, êrişên dewletên Tirkîye, Îran û Sûriyeyê yê li ser xelkê Kurd û Kurdistanê şermizar û protesto dîke û bang li neteweyê Kurd û berpirsiyaran dîke ku tifaqa

neteweyî di serê her tiştî bigirin û di têkoşîna parastina Kurd, Kurdî û Kurdistanê da yêk bigirin. Konferans herweha hêvî dîke ku ev reng kar û xebatên zanyarî û ronakbîrî bêne domandin û xelkê Kurd û desthilatdarên politîk yê Kurdistanê jî hevkar û piştevan bin.

Konferansa Zimanê Kurdî

14-15 Gulan 2008, Berlîn

[KNK Bulten, hj. 6, Teşrîn (Mijdar) 2008]

Li salvegerên damezrandina KNKê beyanat hatine dan. Çendek nimûne li jêr in :

4. SALVEGERA KNKÊ PÎROZ BE

Bruxelles, 24.05.2003

Çaremîn salvegera Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, ji bo gelê Kurdistanê pîroz be. KNK di rojên 24-27ê Gulana 1999an da li welatê Holland bajêrê Amsterdamê civîna xwe ya damezrandinê pêkanî. Ji ber vê yêkê, di van rojan de em di nav pîrozbahiyê de ne.

Kongre, ji bo çareserkirina doza Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê, bi armanca pêkanîna aşîya navxweyî, alîkarîya partî û hêzên Kurdistanî, di çarçoveya rûmetgirtina mafên çarenûsiya gelê me de hatîye ava kirin.

Bi taybetî di vê qonaxa dîrokî ya rojhilatanavîn de, di bin çetra KNKê de pêkanîna yekîtîya neteweyî û li ser xalên hewbeş de kombûna hêzên Kurdistanî, bê guman bersiva pêwîstîya sîyasî û dîrokî ye.

Şîara KNKê bîjî Yekîtîya Neteweyî ya Kurdan!

Bijî aşî, bijî biratî û bimre birakujî!

Konseya Rêvebir ya KNKyê, bi munasebeta salvegera damezrandina KNKyê ya 9.

daxuyanîyek belav kiribû. Naveroka wê daxuyanîyê îro di sala 10. da jî tazehîya xwe diparêze. Dubare li jêr diweşînin:

Salvegera damezrîna KNKyê ya 9.

KNK (Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê) 24ê Gulana 1999ê hate damezrandin. Îsal KNK bû 9 salî. Bîr û hizira avakirina KNKyê ji rewş û statîya Kurdistanê peyda bû û li ser vê hewcehiyê bejn da. Piştî neh salên ji ser damezrîna KNKyê borî jî guhorîneke mezin ya bi dilê neteweyê Kurd, di vê rewş û statîya Kurdistanê da pêknehatîye. Belê digel vê rastîyê, piştî hilweşîna rejîma Seddam ya 2003ê li timamî Iraqê, "parçeyê başûr" yê Kurdistanê di nav tixûbên fermî yê Iraqê da be jî, hem di nav fermiyeta Iraqê da, hem jî di fermiyeta navneteweyî da statuyeyeke federal wergirt ku eve ji bo bi giştî neteweyê Kurd û doza Kurdistanê serkevtîneke giring û bihadar bû. Bi vê statîya nû ya başûra Kurdistanê wekî "Kurdistana Federal", çeperekî sîstemê kolonyalîzma navneteweyî ya li rojhilatanavîn ya li ser Kurdistanê, hate şkandin. Vê gave mane sê çeper û divêt têkoşîneke xurt bête dan ku ev çeperên kolonyalîst jî yêk bi yêk bêne şkandin. Eve jî bi yêkgirtina neteweyî ya Kurdistanê mumkun dibe. KNK her di serî da ji bo vê armanca yêkgirtina neteweyî ava bû û şertên hewcehiya bi KNKyê îro jî dom dikin. KNKyê ji roja ku hatîye damezrandin heta îro, ji bo berjewendiyên neteweyî xebat kirîye, têkoşîn daye. KNKyê yêkgirtina neteweyî kirîye misyonê xwe û ji bo vê yêkê jî çî hewceye kirîye û dê ji îro pêve jî bike. Şik têda nîne ku di vê prosesa yêkgirtina neteweyî da gelek zor û zehmetî û asteng hebûn û hêj jî hene. Di serî da tengbînî, egoîzma kesîni û rêxistinî, berjewendiyên neteweyî nehizirîn û gelek negatîvîyetên di daîm bûyene asteng di vehûnandina yêkgirtina neteweyî da û mixabin îro jî kelem in

ev refat û nêrînên şaş û kem. Lê KNKYê her bi çi halî be xebata xwe ya ji bo yêkîtîya neteweyî sist nekiriye û di vê sala nehemin da jî dê xebata xwe xurttir bidomîne.

Tirkîye, Iran û Sûriye, politîka xwe ya dagîrker û kolonyalîst bi israr didomînin. Ev dewlete bi çu awayî nêzîkî çareserîyeke maqûl nabin. Ji şer, şiddet û antî demokratîzmê pêve politîkeke di di rê nabin. Politîka red û inkara Tirkîyeyê bi asimilasyon û jenosîda li ser ziman, kultur û folklorê Kurdî di dereceya herî xedar da tete domandin. Iran jî kêmî Tirkîyeyê namîne û nihe politîka şer daye ber xwe. Sûriye jî digel metodên polisî, hemû mekanîzmayên xwe bi armanca tepisandina xelkê Kurd û bihayên wî bi kar tîne. Vêca heta ku ev sîstemên ceberrût li Kurdistanê ve hovîtîya xwe bidomînin, hewcehîya yêkgirtina neteweyî dê hergav di serê rojê xelkê Kurd da be û divêt wisa jî be. Hem yêk bi yêk, hem jî pêkve dijî van dewletan divêt stratejîya yêkgirtina neteweyî hergav jînde bête girtin û ji bo pêknana eniya neteweyî hemû fedakarî bêne kirin.

KNK li ber vê tabloya reş û tarî ya sîstemên dagîrker û kolonyalîst ya li Kurdistanê jî, bi hêvî ye û geşbîn e. Ji ber ku îro têkoşîneke mezin tete dan dijî dewleta Tirk, Iran û Sûriyeyê. Bi taybetî digel xebat û têkoşîna sivil û demokratîk, dijî dewleta Tirk û Iranê berxwedaneke mezin di warê leşkerî da jî tete dan. Ji aliyê têkoşîna meşrû ya leşkerî ya Kurdistanê ve, hêzên parastina xelkê Kurdistanê, çeperên ertêşa dewleta Tirk û herweha ertêşa Iranê dişkênin û pêlên şoreşa neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê bilindtir dikin.

KNK bihayekî mezin dide fedakarîya hêzên parastinê û bi rêz û evîna herî germ silavan li wan dike. Dîsa KNK bi xebat û têkoşîna xelkê Kurd ya di warê sivil û demokratîk da jî serbilind e û silavan li têkoşîna wan jî dike. KNK di wê bawerîyê da ye ku îro ji her demî zêdetir hewcehî bi yêkgirtina dînamîkên neteweyî heye û divêt ji bo vê armancê her kes û rêxistin xebatê bike. Di vê prosesa dirêj û bi zor û zehmetî da, heke KNKYê wacibên xwe layiqen neînabin cih jî, eve ji aliyê bingehîn ve ji ber pozîsyon û nêrînên politîka kes û rêxistinên heyî yên Kurdistanê bûye. KNK hêvî dike ku ji îro pêve hemû kes û rêxistinên neteweyî, li goreyî hewcehî û zerûreta yêkîtîya neteweyî hereket bikin û ji bo vê armanca mezin jî fedakarane kar û xebatê bikin.

KNK wekî rêxistineke sihwanyê, der û pencereyên xwe, bane xwe ji bo hemû dînamîkên neteweyî yên Kurdistanê vekirîne. KNK bangî hemû kes û rêxistinên neteweyî dike ku yêkîtîya neteweyî pêkbinin. Ji bo vê armancê KNK jî hazirî hemû fedakarîyan e. Bi van hêvî û daxwazan KNK salvegera xwe ya nehemin li neteweyî Kurd pîroz dike. Hertişt bo yêkîtîya neteweyî ya Kurdistanê.

Konseya Rêvebir ya KNKYê

22 Gulan 2008, Bruksel

[KNK Bulten, hj. 6, Teşrîn (Mijdar) 2008]

Li ser yêkîtî û KNKYê

“... Ger em îşare bi bûyerên siyasî yên di nava Başûra Kurdistanê bikin, divêt bêjî ku, di çaxê derbasbûyî da proseya aşîya navxweyî pêşveçûn bi xwe ve dîtîye. Ji xeynî Partî Demokratî Kurdîstan (KDP) û Yekîtî Niştîmanî Kurdîstan (YNK), hinek ji partiyên di yên siyasî jî vegirtiye: weke Partî Zehmetkêşanî Kurdîstan (PZK) û Partî Sosyalîstî Demokratî Kurdîstan (PSDK) jî ku têkêlî vê proseyê bûne. Di proseya aşîya navxweyî da û hewlên paqijkirina şûnewarên şerê birakujîyê, civîna Encumêna Niştîmanî ya Kurdîstana Îraqê bûyereke giring bû ku bi awayekî gerim pêşwazî jê hat kirin û gelê Kurdistanê li benda hilgirtina pêngavên zêdetir e ji bo bi yêkkirina herdu idareyên Hewlêr û Silêmanî û kirina parlamentê mîna navenda biryar û desthilatdarîyê û zêdekirina proseya aşîyê ji bo ku hemû hêzên Kurdistanê bigire nava xwe...”

Dr. Cebar QADIR

**

“... Weke tê zanîn ji meha Hezîranê vir ve Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Belgeyêke Stratejîya Neteweyî amade kirîye û pêşniyarî rêxistinên Kurdan kirîye. Armanca vê gavê parastina berjewendiyên hemû gelê Kurd e. Divêt kes nefikire ku di bingehê vê

hewldanê de berjewendiyên hêzekê, anjî komekê heye. KNKê, weke sazîyeke neteweyî, di pêvajoyeke wiha giring de, xwe li hemberî gelê Kurd berpirsyar dîtîye ku ev gave avêtîye...”

Ahmed DERE

**

“... KNK berî 9 salan hate damezrandin. Îsal jî bi hêzeke dînamîk ku bi xwe re Belgeya Stratejîk ya Neteweyî anî, careke din Civata Giştî lidarxist. Damezrandina KNKê, di nava Kurdan de heyecan û coşeke mezin derxistibû holê. Îsal jî, coş û beşdarbûneke gûr û geş hebû. Ji bilî nûneran, çavdêrên partî, rêxistin û kesayetiyan Kurd zêde bû. Di van rojên ku dagirkerên Kurdistanê, bi operasyonên hevbeş, cihana Kurd û jiyana Kurd dikine dojeh de, pêwîste KNK dereng nemîne, dengê xwe bilind bike...”

Medeni FERHO

Yeni Ozgur Politika

22 Aralık 2008

Biryara KNKYê : Cejna Zimanê Kurdî bû sê roj; 14-15-16ê Gulanê

KNKê di nav deh salan da gelek biryarên neteweyî standin. Ji van biryarên yêk gelek giring bû: KNKê di dîroka Kurdistanê da cara pêşî bi armanca xurtkirina çeperên bizava neteweyî ya Kurdistanê û parastina zimanê Kurdî, edetê pîrozkirina “Cejna Zimanê Kurdî” da dest pê kirin. Bi vê biryara KNKê, ji sala 2007ê pê ve li seranserê Kurdistanê û diasporayê û her derê ku Kurd lê dijîn, “Cejna Zimanê Kurdî” hate pîroz kirin. KNKê îsal jî li goreyî daxwaza xelkê Kurd, “Cejna Zimanê Kurdî” kire sê roj û îsal [2009ê] “Cejna Zimanê Kurdî” sê rojan hate pîroz kirin. Li jêr birekê ji daxuyanîya “Komîsyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê ya KNKYê” didin:

“... Komîsyonê kombûna xwe di 4ê Nîsana 2009ê da kir û ev biryarên li jêr standin. Em bi giringî pêşkêşî bir û rehîya Kurdistanê dikin:

1. Digel hemû pêşveçûnên li Kurdistanê, ziman, kultur û hunera Kurdî hêj jî, bi gotina herî nerm, di bin tehlîkeya lawazkirinê da ye. Asimilasyona li ser ziman, bi metod û teknîkên nû tete domandin. Çand û hunera Kurdî herwisa di bin tedayêke jenosîdal da ye. Bi taybetî dewleta Tirk, herweha Iran û Sûriye jî beramberî ziman, çand û hunera Kurdî hêj jî hemû rengên qedexetîyê didomînin. Li van dewletan perwerdeya bi Kurdî hêj jî qedexe ye. Zimanê Kurdî heta ku nekeve nav sîstemê perwerdeya fermî ya dewletê pêşnakeve û ji ber asimilasyonê xilas nabe. Lewma divêt li van dewleta armanc ew be ku zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û ji dibistana seretayî heta zaningehê li hemû xelekên perwerdeyê û di nav sîstemê îdarî yê dewletê da bête bi kar înan. Heta ku digihine vê armancê divêt xebat û têkoşin neyê sist kirin û bi hemû rengan bête domandin. Digel vê prosesê, Kurd bi xwe jî divêt di nav parastin û jîyandina ziman da bin. Bi taybetî li bakur şehrîdarîyên Kurdistanê divêt hemû îmkanan bi kar bînin û li goreyî şert û îmkanan her bi çi rengî be zimanê Kurdî bi kar bînin.

2. Li Kurdistanê û meydanên diasporayê ji bo bi kar înana ziman, divêt kar û xebatên perwerdeyî, çandî û hunerî bêne kirin û ji bo vê yêkê dezgeh û organizasyon bêne ava kirin.

3. Di nava jîyanê da edetê Kurdî axivtinê divêt bête xurt kirin, pêşve birin û mayînde kirin.

4. Navên tax, gund, bajêr û bajêran divêt bi Kurdî bêne gotin. Herwisa navê Kurdistanê divêt bi israr bête bi kar înan.

5. Dijî talankirina muzîka Kurdî divêt tedbîr bêne standin. Bi vê armancê dê li ser vê rewşa muzîka Kurdî sempozûmek bête organîze kirin. Herweha stranbêjên ku xizmeta talankirina muzîka Kurdî dikin û muzîka Kurdî dikine Tirkî, Farişî û Erebi divêt bêne boykot kirin.

6. Dîlan û govenda Kurdî divêt bête parastin û rê li ber Tirkkirin, Fariskirin anjî Erebkirinê bête girtin.

7. Hersal di peryoda "Cejna Zimanê Kurdî" ya di rojên "14 - 15 - 16ê Gulanê" da konferansa zimanê Kurdî û aktîvîteyên bi vî rengî bêne kirin.

8. Ji bo plankirina kar û xebatên li ser ziman, perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî, organîzekirina zimanî û amadekirina materyalên perwerdeyê, îsal li payîzê li Berlînê dê "Şûraya zimanê Kurdî, perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî" bête kom kirin.

9. Medyaya Kurdî ya nivîskî û elektronîk ji bo agahdarkirin, hişyarkirin û serwextkirina xelkê Kurd ya di warê axivtin û bi kar inana zimanê Kurdî da divêt zêdetir program, nûçe û nivîsan biweşînin.

10. "Cejna Zimanê Kurdî" ji îsal pêve bû sê roj. "14ê Gulanê" wekî "Roja Cejna Zimanê Kurdî" 2006ê bi biryara KNKYê hate qebûl û îlan kirin. Cara ewil 14ê Gulana 2007ê li seranserê Kurdistanê û meydanên diasporayê hate pîroz kirin û ev edete di 14-15ê Gulana 2008ê da jî bi "Konferansa Zimanê Kurdî ya li Berlînê" dom kir. Ji ber asîmîlasyonê salan û qedexeya bêhnçîkêr ya li ser zimanê Kurdî, "14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî" ji teref xelkê Kurd ve bi germî hate qebûl kirin û bi çêş û heyecanê mezin hate pîroz kirin. Xelkê Kurd ev cejne wekî çeperekî xurt yê parastina zimanê Kurdî qebûl kir û lê xwudan derket û di mîdehê du salan da bi boşahiyeke gelek mezin pîroz kir. Îro bi reng û metodên nû zulma li ser zimanê Kurdî bi îsra tete domandin. Di rewşeke wisa da xelkê me bi xwe bi şûra li ziman xwudanderketinê ji KNKYê daxwaz kir ku rojek têra nake û rojên "Cejna Zimanê Kurdî" divêt bêne zêde kirin. Ji ber vê hewcehiyê, îsal komisyona me, "Komisyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê ya KNKYê" "Cejna Zimanê Kurdî" bi armanca dijî her reng asîmîlasyonê û parastina zimanê Kurdî û pêşvebirina ziman û perwerdeya Kurdî, derêxiste "sê rojan" ku bi berfirehtir bête pîroz kirin û li ser giringiya ziman bi zanahîtir û berpirsiyarîtir bête rawestan. Ji îsal [2009] pêve "Cejna Zimanê Kurdî" dê di rojên "14 - 15 - 16ê Gulanê" da bi axivtin, şahî, resepsiyon, semîner, konferans û kombûnan bête pîroz kirin. Li seranserê Kurdistanê û meydanên diasporayê, Kurd dê li goreyî şert û îmkanên xwe pîroz bikin û di nav aktîvîteyan da bin. Planê pîroziya "Cejna Zimanê Kurdî" jî bi vî rengî hatîye tesbît kirin:

• 14ê Gulanê: Destpêka pîroziya "Cejna Zimanê Kurdî" ye. Li ser zimanê Kurdî dê axivtin û şahî bêne kirin.

• 15ê Gulanê: Roja weşana kovara Hawarê ye. Hawarê ji bo parastin û jiyandina ziman û kultura Kurdî kedeke mezin daye. Ji ber vê yekê, jî bo bîrîna kovara Hawarê dê rola wê ya di warê parastin û jiyandina ziman û kultura Kurdî da bête biha kirin û pîroz kirin.

• 16ê Gulanê: Ji bo giringiya perwerdeya bi zimanê Kurdî dê kombûn, semîner û konferans bêne kirin. Herweha ji bo xatiraya hemû şehîdên Kurdistanê, ku ji bo parastina ziman, kultur û hunera Kurdî, neteweyê Kurd û Kurdistanê canê xwe yê pîroz feda kirine, di roja dawiyê ya "Cejna Zimanê Kurdî" da, dê hemû şehîdên Kurdistanê bêne bîrînan. Bi vê armançê xelkê Kurd dê bi gul û kulîlkan biçîne ser av, çem û robarên Kurdistanê û wan qevdên gul û kulîlkan biavêjîne nav av, çem û robarên Kurdistanê û rêzê li gîyanê pak yê şehîdan bigîrin.

Em hevî û bawer dikin ku xelkê me yê Kurd dê vê gava giring ya parastin û jiyandina zimanê Kurdî, wekî edetê neteweyî pîroz bike û heta hetayê bidomîne. Em ji niha ve "Cejna Zimanê Kurdî" ya neteweyê Kurd pîroz dikin..."

Komisyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê ya KNKYê
4 Nîsan 2009, Bruksel

**

"... Ji îsal [2009] pêve "Cejna Zimanê Kurdî" dê di rojên "14 - 15 - 16ê Gulanê" da bi axivtin, şahî, resepsiyon, semîner, konferans û kombûnan bête pîroz kirin. Li seranserê Kurdistanê û meydanên diasporayê, Kurd dê li goreyî şert û îmkanên xwe pîroz bikin û di nav aktîvîteyan da bin..."

Abdullah Ocalan:

KNK dikare xwe bide organîze kirin

Xwe bi rêxistinî bikin:

Xwe bi rêxistinî bikin, dem û dezgehên sivil saz bikin. Perwerdehiya bi zimanê Kurdî berfireh bidin destpêkirin. Van bikin pratîkê. Eve mafên demokratîk yên gelê Kurd in. Siyaseta demokratîk hunerek e. Iradeyê dixwaze, enerjîyê dixwaze. Gelek wezîfe û berpirsiyarî dikevin ser milê Kurdan. Pêwîst e Kurd, bêhtirîn yekîtiya xwe saz bikin û pêşbixin. Pêwîst e hevkarî û yekîtiya xwe bi hêz bikin; ji bo vê jî pêwîst e şev û roj kar bikin.

KNK dikare xwe bide organîze kirin:

"KNK dikare xwe bide organîze kirin. Ne şubî avabûna federal ya li başûr, bi rengê sivil û serbixwe dikare xebatên xwe bidomîne. Di nav KNKê da temsîlkar û berdevkên her parçeyî dibin. Bi vî rengî dikare temsîlyeta her parçeyî pêkbîne. KNK dikare wekî PLO [Rêxistina Rizgarîya Filistinê] bibe. Di navê da PDK jî, YNK jî dikarin bibin..." [Ji hevdiitina Ocalan ya digel awûkatan; ANF, 28 Adar 2009]

Nameyek ji serokê KNKYê

yê I. Îsmet Şerîf Wanlî bo

Mesûd Barzanî

Birêz Mesûd BARZANÎ

Serokê Partîya Demokrat ya Kurdistanê

Hewlêr / Kurdistan

Bruxelles, 16. 08. 2003

Birêz Serok,

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, salvegera 57. ya Partîya Demokrata Kurdistanê, bi germî pîroz dike. Herweha 57. salvegera PDKê ji bo cenabê we, ji hemû endamên Partiyê û ji bo Gelê Kurdistanê re jî pîroz be. Tekoşîna ku Barzaniyê Nemir dabû destpêkirinê, gehîşte qonaxa çareseriyê. Di vê qonaxê de Gelê Kurd, ji bo ku li Kurdistan û Iraqê sistemekî azad û demokratîk pêk bêt, di herêmê de bûye hêzeke esasî. Bê guman di pêşveçûna tekoşîna Gelê Kurd de, rola PDKê giring e. Em hevî û bawer dikin ku PDK ji bo Kurdistanê azad û ji bo yekîtiya neteweyî, dê rola xwe ya dîrokî berdeyam bike. Li ser vî esasî, salvegera 57. ya Partîya Demokrat ya Kurdistanê careke di pîroz dikim, silav û rêzên biratiyê pêşkêş dikim.

Îsmet Şerîf Wanlî
Serokê KNKYê

Ji axivtina serokê KNKYê yê II. Elî Yigit ya li civîna giştî ya 8.

”... Tekoşîna gelê Kurd di dema îro de di asta herî bilind de nêzikî çareserîyê bûye. Lê belê, ev jî rastîyek e ku di vê demê de ji her demê bêhtir pêwîstî bi yekîtîya neteweyî heye. Encax bi xwedîderketinek bi quwet em karin deskeftîyê hatine çêkirin biparêzin. Yana her demê dikare ev qezenc û nîrxên gelê Kurd ku bi bedelên herî giran bi dest xistine, dikare ji dest here.

Dû van herdu salên derbasbûyî de me gelekî hewil da ku em karibin kar û xebatên KNKYê hîn baştir pêkbinin, lê maalef wek tê xwestin nebû. Me dixwest em hijmarek endamên xwe tevî hinek xebatan bikin. Lê ji ber sebebên ne di destê me de ev jî pêknehat. Ji bona serastkirina van pisgirêkan me gelek hewil da...”

21. 06. 2008

Serokê III. yê KNKYê Tahir Kemalîzade:

Tahir Kemalîzade di seradanîya xwe ya başûr da beyanatek li ser ”Konferansa Neteweyî” da medyaya Kurdî. Li jêr kurteyekê didin:

“... Bi armanca ku em hemû alîyan bînin nik hev û têkildarî konferansê hindêk danûstandina bikin, wekî KNK hatin Herêma Kurdistanê. Em dixwazin hemû alî bîn nik hev ku ber bi aramanceke neteweyî û stratejîyêke neteweyî ve gavekê biavêjin. Hersal em tînan başûra Kurdistanê û bi partî û kesayetiyan vê derê ra hevdiîtinan pêktînin. Ev demek e behsê konferansê tête kirin. Niha em dê lêbinêrin ka gelo xebatên tîne kirin anjî tiştê tête fikirîn konferanseke neteweyî ye an wekî ‘Platforma Abantê’ ye. Eger konferanseke neteweyî be, pêwîst e her alî di komîteya amadekar de cih bigirin. Pêşniyarên hemû beşên Kurdistanê ji komîteya amadekar ra bêne pêşkeş kirin...”

“... Divêt çu partî li derveyî konferansê neyên hêlan. Çiku armanca me yekîtîya neteweyî ye. Eger hindêk rêxistin li derveyî vê yêkê bêne girtin, hingê manaya pêkînan konferansê namîne. Mijarên bila filan rêxistin çekê dayne anjî nedayne ne mijara konferansê ne. Mijara konferansê ya esasî divêt ew be ku dîroka têkoşîna Kurdan ji nû ve bête munaqêşe kirin. Gotina heta niha bila ev rêxistinên li bakura Kurdistanê tevli konferansê bibin an nebin? Ev munaqêşe munaqêşeyên vala ne...”

[DÎHA / HEWLÊR / YENÎ ÖZGÜR POLİTİKA,
09 Mayıs 2009]

Li ser pîrozbahîya Cejna Zimanê Kurdî daxuyanîya KNKYê

14–15–16ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî pîroz be !

Ji niha ve amadekarîya pîrozkirina Cejna Zimanê Kurdî bikin !

Bo xelkê Kurd û Kurdistanê, Bo hemû dem û dezgeh û rêxistinên Kurd û Kurdistanê

Zimanê Kurdî digel neteweyê Kurd, di nav mexdûrfiyeta cîhanê da li rêza serî ye. Zimanê Kurdî hêj jî bi ber qedexeyan dikeve û zordestîya li ser zimanê Kurdî bi hemû reng û metodan didome. Serê vê êrişkarîya bîyûm dewleta Tirk dikêşe û dewletên Îran û Sûrîyeyê jî kêmtî wê nînin. Li van dewletan, Kurdî, bi taybetî di pratîka polîtîk û weşangerîya bi giştî da bi hemû rengan hêj jî rastî hizaran astenga têt. Di nav sîstemê perwerdeya fermî da ji xwe nîne. Bi metod û teknîkên nû asîmîlasyon tête domandin. Zimanê Kurdî li van dewletan, bi manaya ku em têdigihin, hêj jî ne azad e. Ji ber vê yêkê, heta ku Kurd azad û Kurdistan rizgar dibe, heta ku zimanê Kurdî di nav sîstemê perwerdeyê da bi kar têt, heta ku zimanê Kurdî di nav mekanîzmayên dewletê da dibe fermî, têkoşîna zimanê Kurdî dê dom bike û divêt bidome.

Yêk ji armanca bizava neteweyî ya xelkê Kurd jî ew e ku zimanê Kurdî ji vê rewşa bêhnçikêr xilas bike, rê li ber pêşveçûn û geşbûna zimanê Kurdî veke. Ewe ji aliyê bingeşînan ve bi xelkê Kurd ve girêdayîye. Anku xelkê Kurd di serî da divêt bi xwe li zimanê xwe xwudan derkeve, dijî hemû astengî û zordestîyan zimanê xwe, bi israr, di nav hemû xeletên jîyanê da bi kar bîne. Yêk ji çeperên xurt yê dijî dewletên kolonyalîst û asîmîlasyonîst jî parastina makzimanî ye. Lewma xelkê Kurd divêt dijî van dewletên asîmîlasyonîst, têkoşîna ji çeperê ziman ve sist neke, zimanê xwe “de facto” di hemû dem û dezgehên fermî da bi kar bîne, li ser sîstemê ferz bike.

KNK wekî rêxistina bilind ya neteweyî, giringîyêke mezin dide bizava li ziman xwudan derketinê. KNKYê bi vê armancê, daku têkoşîna dijî dewletên asîmîlasyonîst xurt bibe, çeperekî nû ava kir û di sala 2006ê da biryar da ku 14ê Gulanê wekî Cejna Zimanê Kurdî bête pîroz kirin. Ji sala 2007ê were jî Cejna Zimanê Kurdî bi şuûreke mezin ya neteweyî tête pîroz kirin. KNKYê îsal li ser daxwaza xelkê Kurd, biryareke nû stand û Cejna Zimanê Kurdî kire sê roj. Ji îsal pêve, Cejna Zimanê Kurdî di 14-15-16ê Gulanê da dê bête pîroz kirin. KNK vê gazîya neteweyî digihîne xelkê xwe ku dijî bêdadîya dewleta Tirk û herweha dewletên Îran û Sûrîyeyê ya ku bi serê zimanê Kurdî tînin, têkoşîna xwe bilind û xurttir bikin. Bila ev rojên Cejna Zimanê Kurdî bibine zemînê têkoşîna antî asîmîlasyonîst û antî kolonyalîst. KNK di wê bawerîyê da ye ku, qonaxa îro ya têkoşîna neteweyî têda, wezîfeyêke neteweyî li ser milê her Kurdî ferz dîke ku alaya dengî ya neteweyê Kurd, anku zimanê Kurdî, hakimî jîyana xwe bikin û bi dewletên dagîrker û asîmîlasyonîst bidine qebûl kirin.

KNK hêvî dîke ku Cejna Zimanê Kurdî di van hersê rojan da, li seranserê Kurdistanê, meydanên diasporayê û her derê ku Kurd lê, bi coş û heyecaneke mezin bête pîroz kirin.

KNK bangî xelkê xwe dîke ku vê cejna pîroz, Cejna Zimanê Kurdî, hêjayî têkoşîna salan û bedelên giran pîroz bike.

Bi van bîr û bawerîyan, KNK Cejna Zimanê Kurdî li hemû neteweyê Kurd û Kurdistanîyan pîroz dîke.

Konseya Rêvebir ya KNKYê
2 Gulan 2009, Bruksel

Deh salîya KNKyê pîroz be

KNK bi armanca yêkitîya neteweyî li 24ê Gulana 1999ê hate damezrandin. Hewcehiya yêkitîya neteweyî ji kûrahîya salan were heye û ev daxwaze îro jî dom dike. Heta ku nîrê kolonyalîzmê tete şkandin, Kurdistan tete rizgar kirin, xelkê Kurd û hemû Kurdistanî azad dibin, ev daxwaze dê daîm hebe. Ji daxwazên salan jî tete têgihîştin ku neteweyê Kurd û Kurdistanîyan çu cara ev daxwaza giştî sar û sivik nekirine, di her şert û delîveyî da bilind kirine û bihayekî mezin dane vê armançê. KNK wekî rêxistineke seranserî ya Kurdistanî di demekî wisa da hate ava kirin ku pêdivîya bi yêkitîyê, di dereceya lezîniyeta man û nemanê da bû. Terkîba KNKyê her ji destpêkê were bi temsîliyeta piranîya maqûl ya Kurd û Kurdistanîyan pêkhat. KNK bi avabûn, terkîb, program û xebata xwe ve xwast bibe zemînekî saxlem yê yêkitîya neteweyî ku prosesa yêkitîya herî fireh ya ku tete xwastin, gav bi gav bête vehûnandin. KNKyê di vî warî da gaweke avêt û vê hewildana xwe didomîne. KNKyê di midehê van deh salan da daîm xwast ku çu kes û hêzên neteweyî li derveyî vê prosesê nemînin. Di vê çarçoveyê da gelek kar û xebatên di berjewendîyê neteweyî da pêkînan. Lê KNK vê prosesa vehûnandina yêkitîya neteweyî stafîk nabîne, dînamîk qebûl dike û li goreyî vê rastîyê bizava xwe ya ji bo pêkînana mezin ya neteweyî didomîne. KNK bi bawerî ye ku ev xebat û têkoşîna ji bo yêkitîya neteweyî ya ku tete xeyal kirin dê pêk-bêt. Deh salên hatine jîyan bi van hêvîyan ve tijî ne. Em wekî Konseya Rêvebir ya KNKyê girêdayî vê îdealê ne û herweha bangî hemû kes û hêzên neteweyî jî dikin ku her bi çi reng û awayî be, bi taybetî di van rojên teng û dijwar da ku kolonyalîst terora xwe li ser Kurd û Kurdistanê didomînin, mil bidine bizava vehûnandina yêkitîya mezin ya neteweyî ya Kurd û Kurdistanê. Bila bîr û hizira yêkitîya neteweyî her jînde bimîne di sere Kurd û Kurdistanîyan da. Bi van bîr û hiziran em deh salîya KNKyê li neteweyê xwe û hemû Kurdistanîyan pîroz dikin. Hertişt bi yêkitîya neteweyî!

Agahdari: KNK deh salîya xwe li 24ê Gulanê li merkeza xwe ya li Brukselê bi resepsiyonekê pîroz dike. Kurd û Kurdistanî vexwandî ne û dikarin pîrozbahîyên xwe bi hatin anjî rêkirina mesajên bi cih bînin.

Konseya Rêvebir ya KNKyê:

Tahir Kemalîzade, Serok
Adem Uzun Cihgirê serok
Nîlûfer Koç, Cihgira serok
Nezîf Mayî, Cihgirê serok
Gelavêj Qadîrî, Cihgira serok û Seroka Komîsyona Jinan
Remzî Kartal, Serokê Komîsyona Karê Derve
Rojan Hazim, Serokê Komîsyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê
Fêlemez Başboga, Serokê Komîteya Karê Neteweyî
Şemsetîn Aktaş, Serokê Komîteya Çapemeniyê
Hêvî Berwarî
Miryem Muezzînî
Nizamettîn Toguç
Seyf Bedir-Xan
Corc Aryo
Medenî Ferho

20 Gulan 2009, Bruksel



KNK Bulten

Organa KNKyê ye.

Nêrîn û daxuyanîyên KNKyê bo endam û bîr û

rehîya giştî radigihîne.

Sê meha carekê derdikeve.

Dîzayn & Layout: RH

Amadekarên vê hejmara taybetî:

Medenî Ferho

Rojan Hazim

Edîtorê vê hejmara taybetî: ROJAN HAZIM

anitosa@gmail.com

Adres:

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]

Rue Jean Stas 41 / 1060 Bruxelles, Belguque

Tlf.: 0032 2 647 30 84 / Fax.: 0032 2 647 68 49

www.kongrakurdistan.net/com/org

e.mail: kongrakurdistan@gmail.com

KNK Bulten

Gulan 2009, hejmara taybetî ya deh salîya KNKyê

*

**Deh salîya KNKyê bila li Kurd
û Kurdistanîyan pîroz be!**